

Ji Çapemeniyê û Raya Giştî re;

Mûwekîlê me Rêzdar Abdullah Ocalan ji sibata 1999an heta niha, mûwekîlên me yên din Rêzdar Hamîlî Yildirim, Rêzdar Omer Hayrî Konar û Rêzdar Veysi Aktaş jî ji adara 2015an heta niha di Girtîgeha Îmraliyê ya Ewlekariya Bilind de, ku girtîgeheke di nava giravê de ye tîn girtin. Şert û mercên girtina wan a ku li wê derê li ser wan tê ferzkirin derveyî mewzûata neteweyî ye û nikarin sûdê ji tu mafên xwe yên bingehîn wergirin.

Ligel ku derbarê vê mijarê de gelek caran ji aliyê me ve serlêdan û gilî hatine kirin mafên zagonî nehatine pêkanîn. Têkiliya fizîkî ya herî dawiyê ya ku bi wan re hatiye danîn, hevdîtina malbatê ya 3ê adara 2020an e. Ji wê rojê heta niha destûr nehatiye dayîn ku têkiliyeke fizîkî pêk bê. Ancax salekê piştî vê hevdîtînê, di encama spartina şert û mercên awarte, di 25ê adara 2021an de tenê ji bo carekê derfet hatine saz kirin ku bi riya telefonê hevdîtînê pêk bînin. Mûwekîlên me Rêzdar Omer Hayrî Konar û Rêzdar Veysi Aktaş bi armanca protestokirina rewşa tecrîda li ser xwe derneketine hevdîtina bi riya telefonê. Hevdîtina Rêzdar Ocalan jî ya ku bi birayê xwe re pêk anî di niviyê de hatiye birin û hatiye bi dawî kirin. Piştî vê rewşa têkilîdayîna bipirsgirêk xwegihandina tu agahiyên ku hatine teyîtkirin pêkan nebûye.

Piştî vê hevdîtina ku me behsa wê kirî, va ye 20 meh e mûwekîlên me bi awayekî bitevahî ji cihana derve hatine qut kirin, di şert û mercên bêdanûstendineke teqez de tîn girtin. Ev yek çawa ku li dij rabeberî nixrêna hiqûqî yên navneteweyî û mewzûata neteweyî ye, di heman demê de tê wateya êşkence û kiryarên xirab. Bi armanca ku em balê bikişînin ser encamên heyî yên vê kiryarê yan jî encamên dibe ku rû bidin û ji bo telafîkirina wê, di nava vê demê de li gel ku gelek hewldanên me çêbûne jî mixabin pêkan nebûye ku encamek bê girtin.

Mekanîzmayên Neteweyî û Navneteweyî Bêbandor in

Ji aliyê me ve, serlêdanên ji bo Saziya Venihêr a Giştî, Lijneya Lêkolîna Mafên Mirovan a Meclîsa Miletî ya Mezin a Tirkiyeyê, Saziya Mafên Mirovan û Wekhevîyê, Wezaretê Dadê û Şaxên wê yên tîkildar ên ku mekanîzmayên zagonî yên venihêrîn û lêkolînê ne û gelek saziyên civakî yên sivil pêk hatine. Herwiha, serlêdanên me ji bo Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê, Komîteya Mafên Mirovan a Neteweyî Yekbûyî û yekeyên wan ên jêr ên ku li dijî êşkenceyê hatine saz kirin pêk hatine. Serlêdanên me bi gelemperî bêbersiv hatine hiştin, bi vî rengî vala hatine derxistin û encameke ku pêkanînen tecrîdê biguherîne derneketiye holê. Ji vî alî ve divê em bi bîr bînin ku wezîrê dadê yê dema xwe, di sala 2019an de, piştî pejirandina serdana endamên Komîteya Pêşlêgirtina Êşkenceyê ya Ewropayê (CPT) diyar kiribû ku li ber pêkhatina hevdîtinan tu rewşeke ku bibe asteng nîne. Wê heyamê, ji aliyê raya giştî ya demokratîk ve mafdariya têkoşîna ku bi şewaza greva birçîbûnê bilind bûbû hatibû pejirandin. Bes, hewce ye em bendewariya xwe destnîşan bikin ku divê derdorên tîkildar soza xwe ya ku digotin ev yek pirsgirêkeke hiqûq û demokrasiyê ye, ji ber vê yekê ew ê têkoşîna dewr bigirin bînin cih.

Divê Raporên Lijneyên Şopandina Girtîgehan Bi Raya Giştî re Bê Parvekirin

Hem di mewzûata neteweyî de hem jî di hiqûqa navneteweyî de ne pêkan e ku girtîgehek bitevahî ji cihana derve re bê girtin. Saziyeke ceza û înfazê ya ku ji serdanên parêzer û malbatan re girtiye, mafê danûstendina binivîskî û telefonê nayê pêkanîn divê nebe. Nabe ku têkiliya

girtiyekê/î bi tevahî bi parêzer re bê astengkirin û diviyatiyeke hiqûqî ye ku di her şert û mercan de destûrdayîna riya têkilîdayînê vekirî bimîne. Lê bele, tevî vê, va ye 20 meh e, ne ku pêkanîna têkilîdayînê, têkilî tê astengkirin ku em ji mûwekîlên xwe agahiyekê wergirin. Li gor pêwîstiya zagonî, raporên derbarê Îmraliyê de yên ku ji aliyê Lijneyên Şopandina Girtîhgehan ên Bajêr ên ku divê 2 mehan carekê biçin serdana girtegehê û di cihê xwe de çavdêrî û tesbîten xwe bikin rapor, divê bi raya giştî re bên parvekirin, lê nayên parvekirin.

Em Derbarê Tu Geşedanên Şertên Mûwekîlên Xwe de Agahdar Nîn in

Em di mijarên wek mûwekîlên me xwe digihînin agahiyan an na, pirtûkên ku ji wan re tîndarî rastî sansûr û sînoordarkirinê tîndarî an na, rojnameyên rojane û kovar di çend rojan de digihîjin ber destê wan, xwe digihînin televizyon û radyoyê yan na, ne xwedî agahî ne. Li gel vê, em xwedî agahî ne ku ji ber sedemên cezayên rêzkariyê yên ku wek sedema qedexekirinê serdanê tîndarî nîşandayîn mudaxele li mafên çalakiyan ên hevpar hatiye kirin. Di raporên CPTyê de jî hatibû destnîşankirin ku cezayên rêzkariyê yên hatine dayîn “xapînok”in û nayên pejiwandin. Bi kurtasî, bi arasteyên derveyî hiqûqê û bi biryarên polîtîk va ye 20 meh e agahiya me nîn e ku Rêzdar Abdullah Ocalan û mûwekîlên me yên ku di heman girtîgehê de dimînin rastî kîjan kiryanan tîndarî û şert û mercên wan ên şênber çî ne.

Gelo CPTyê, Di Dema Serdana Xwe ya Îmraliyê de Bi Rêzdar Ocalan re Hevdîtîna Kir An Na?

Di vê pêvajoyê de ji bo ku fikarên me yên ku tecrîda teqez bûye sedema wan ji holê bîndarî rakirin tîndarî watedar tenê serdana CPTyê ya ku di navbera 20-29ê îlona 2022yan de pêk anîbû ye. CPT, di vê serdana xwe de, ya ku mijara wê navendên paşveşandinê bû, li gel ku di plansaziya wê de tunebû jî serdana Îmraliyê jî kiriye.

Herçiqas ev serdana CPTyê daxwaza me ya bîngêhîn be jî, beriya pêkhatina vê serdanê, awayê pêkhatinê û geşedanên piştî pêkhatina serdanê ya bi vî awayî fikarên me hê zêdetir kirine. Ji ber vê yekê bi CPTya ku erênî nêzîkî daxwaza me ya jivana (randevuya) bi wan re bû, di 13ê cotmeha 2022yan de me hevdîtineke rû bi rû pêk anî. Di vê hevdîtîna de, rayedarên CPTyê derbarê şert û mercên mûwekîlên me de tu agahî nedan û bersîva tu pirsên me jî nedan. Di hevdîtîna me ya ku li derdora 45 deqîqeyan domiya de rayedaran ji bo her pîrseke me prosedûrên ku CPT girêdayî wan e bi bîr anîn û tenê gotin ku ew ê derbarê serdana ku pêk anîne de raporekê amade bikin, vê raporê pêşkêşî Tirkiyeyê bikin û ancax bi erêkirina Tirkiyeyê re bikarin vê raporê bi raya giştî re parve bikin. Em ji tecrûbeyên xwe yên borî dizanin ku ev prosedûr di navbera salek û salek û nivê de temam dibe. Ancax di rewşeke wiha ku em nikarin tu agahiyan hildin de demeke wiha dirêj dê bibe sedema zerarên mezin ku telafîya wan ne pêkan e. Helbet, haya me ji hevpeyman û prosedûrên ku CPT girêdayî wan e heye. Lê em vê yekê jî baş dizanin ku, ev rewş ne asteng e ku derbarê mûwekîlên me yên ku 20 meh in em nikarin agahiyê jê hildin de agahdarî bê kirin.

Herwiha, qasî ku agahiya me jê çêbûye, dema ku CPT di îlona 2022yan de diçe serdana Îmraliyê Rêzdar Ocalan derneketiye hevdîtîna. Mixabin, di hevdîtîna me ya bi CPTyê re berevajiyê vê yekê nehatiye teyîdkirin. Taybetiya sereke ya serdanê CPTyê ew e ku bi girtiyan re hevdîtîna taybet dike; rastbûna agahiya ku me bihîstî dê serdana CPTyê hê zêdetir ji nîqaşê re veke. Ji ber

van sedeman, hem serdana dawiyê ya fîlî ya CPTyê, hem jî hevdîtina me ya dawiyê ya ku me bi CPTyê re pêk anî li şûna ku fikarên me kêma bikira zêdetir kiriye. CPT li gor pêwîstiya nîrxên avabûn û hiqûqa navneteweyî ya ku girêdayî wê ye divê derbarê serdana Girava Îmraliyê de, ku di nava qada rayeya wê de ye agahiyan parve bike.

Diviyatiyeke Hiqûqî Ye Ku Dawî Li Tecrîdê Bê Anîn û Hevdîtînen Birêkûpêk Bê Kirin

Daxwaz û agahdarkirinên me yê birêkûpêk ên ku em pêşkêşî CPTyê dikin berdewam dikin. Bi heman awayî, ji bo ku em micîdiya rewşê ragihînin û bi armanca ku em daneyên di destê xwe de bi rêzdar wezîrê dadê re parve bikin serlêdanên me yê ji bo Wezaretê Dadê hene. Ji bo ku serdanên parêzeran pêk bînin, serlêdanên me bi rengekî birêkûpêk bênavber ji bo Serdozgeriya Bursayê, Dadgeriya Înfazê û gerîndetiyê girtîgehê pêk tînin.

Di vê çarçoveyê de, li gor pêwîstiya pêkanîna mafên makezagonê û hiqûqa navneteweyî, daxwaz û bergeriya me ya ku divê mûwekilên me demildest bi parêzerên xwe re hevdîtîne pêk bînin, saziyên pêwendîdar bersîveke erênî bidin daxwazên me û wek peywira xwe agahiyên pêwîst bidin me bi awayekî bênavber didome. Em vê mijarê, bi baweriyê ku her kesên alîgira/ê azadî û mafên bingehîn e, ji bo ku ev rewşa nemirovî ji holê rabe dê hestyariya ku hewce dike nişan bide û şopdarên vê pêvajoyê bin, pêşkêşî raya giştî dikin.

Bi Rêzdarî

Buroya Hiqûqî ya Sedsalê

29.11.2022